



Ji bo tevahiya dêûbavên, zarokên
wan diçin kreşên Berlinê

07.09.2021

Agahiyên ji bo dêûbavan ên di derbarê destpêkirina sala nû ya kreşê de

Dêûbavên hêja, stî û mîrzayên rêzdar,

Navendên lênêrîna zarokan ên li Berlinê bi awayekî serkeftî dest bi sala xebata kreşê ya 2021/2022an kirin. Tevahiya zarokan dikarin bi riya xebata asayî ji mafê lênêrî sûdê bigirin, ji ber ku bi gelemperî hejmara bûyerên enfeksiyonê kême.

Ji ber zêdebûna rêjeya derzîlxwedanê, stratejiya Berlinê ya testkirinê û bicîanîn û tevgera li gorî pîvanên paqijiyê û her wisa yê hewakirin û bikaranîna maskeyan, bi taybet di dema pêwendiya di navbera mezinan de û bicîanîna pîvanên ji bo sazkirina civînên dêûbavan, şahî û pîrozbahiyên, hejmara bûyerên enfeksiyonê kême in,

Ji bo me, ev pîvanên li jor diyarkirî bi taybet ji ber payîz û zivistana li pêş me dê her wisa di demên pêş de jî dê gelek girîng bin. Ji ber vê yekê em her wisa derfeta testkirina zarokên we jî berfirehtir dikin:

Berfirehkirina stratejiya Berlinê ya testkirinê

Welatê Berlinê dê bi riya navendên lênêrîna zarokan a danê rojê PoC-testên-zû-yên-antîjen ji bo testkirina zarokê/a we ya bi rêkûpêk û bi dilxwazî ji bo we amade bike. Piştî nivê meha Îlonê hûn dikarin bi riya navenda lênêrîna zarokan a danê rojê ji bo testkirina zarokê/a we ya hefteyê 2 caran testên-zû-yên-antîjen bigirin, di destpêkê de bi qasî hete Cotmeha 2021an.

Ev derfetên testkirinê yê berfirehkirî pîvanên hete niha yê di derbarê testkirina ji ber sedemekê de tamam dikin, bo nîmûne ji bo zarokên nîşaneyên wan ên nexweşiyê hene, zarokên ji betlaneya xwe ya li derveyê welêt vedigerin an jî gava li hêlîna zarokan bûyereke enfeksiyonê rû bide.

Em ji we rica dikin, ku hûn bi awayekî domdar û bi rêkûpêk ji vê derfetê sûdê bigirin, û bi vî awayî bibin alîkar, da ku xebata lênêrîna zarokan ewle be.

Li gel vê tedbîrê her wisa dê projeya cerebeyê ya ji bo bikaranîna testên PCR ên bi lolîpopê bidome. Wekî din hêlînên zarokan dê ji bo testkirina bi rêkûpêk a xebatkarên xwe hinek testên din ên antîjenê bigirin.

Karantînaya ji bo kesên têkildar ên nêzîk

Bi Rêzîknameya Pêncemîna di Derbarê Guhertina SARS-CoV-2 a Rêzîknameya Tedbîrên Parastina ji Enfeksiyonê a Sêyemîn (SARS-CoV-2 InfSchVO) senatoyê zelal kir, ku karantînaya ji bo kesên têkildar ên nêzîk, ji bo zarokên hêlînê yê testên wan pozîtîv derketine jî derbas dibe û ev yek ji bo parastina derdorê dibe alîkar.

Ji ber ku di qonaxa pêşî ya enfeksiyonê de gelek mirov pê ketine, senatoyê **demdirêjiya karantînayê ango dema xwe-îzolekirinê ji 14 rojan daxist pênc rojan**. Bi vî awayî karantînaya kesekî/ê têkildar ê/a nêzîk bi riya pêşkêşkirina testeke negatîv PoC-testa-antîjenê an jî testa PCRê herî zû di roja şeşan de a piştî pêkhatina nexweşiyê diqede. Bi vî awayî divê zehmetiya ji bo malbatên Berlinê, ku ji ber pîvanên karantînayê pêk hatiye, bi qasî ku pêkan e kêmbimîne.

Biryara di derbarê, kî kesê/a têkildar ê/a rêza yekemîn e, bi riya axaftina di navbera hêlîna zarokan û Daîreya Tenduristiyê ya berpirsyar de tê standin.

Navbera-Koronayê ji bo demên malbatî û demên betlaneya malbatî hêsantir bikin

Ji bilî van yekan em dixwazin agahî bidin we, ku Wezareta Federal a Malbatan di çarçoweya Bernameya Federasyonê ya “Xwegihandina piştî koronayê ya ji bo zarok û ciwanan” ji 01.10.2021an heta 31.12.2022an li tesîsên bêhnvedanê yê ji bo malbatan ên xêrxwaz piştgiriya dide demên betlaneya malbatî. Ev bername bi taybet ji bo malbatên ne dewlemend (dahatûya wan kêmbim) û her wisa malbatên xwedî zarok an jî endamên malbatê yê bi astengî ye. Malbatên xwedî maf dikarin bi riya vê programê navbereke malbatî bi awayekî erzan li tesîsên bêhnvedanê yê ji bo malbatan ên xêrxwaz derbas bikin û wekî din dikarin li navendên li gorî awayê bêhnvedana malbatê li her çar aliyên Almaniyayê rezerve bikin û li wê derê tenê ji sedî dehê heqê cîyê razanê û xizmetê bidin.

Li ser vê malperê agfagiyên berfirehtir hene:

<https://www.bmfsfj.de/bmfsfj/themen/corona-pandemie/corona-auszeit-fuer-familien>

Li gel silavên germ

Peywirdar

Holger Schulze

Rêveberê Daîreya V

Malbat û Perwerdehiya Zarokên Biçûk